Newroz Hejmar (76) Rûpel (6) Ç.Pêşîn 2007z – 2619k

Hevpeyvîn bi nivîskar û hunermendê Kurd

Lwend Ozkan re

Lewend Ozkan, yek ji nivîskar û hunermendên kurd e, li kurdistana bakur dijî wêney, li **Diyardekrê** ez rastî vî hunermendî hatim , piştî naskirina me ji hevre, min jê xwest ku hevpeyvînekê pêre bikim , yekser wî erê kir.

Mamoste **LEWND OZKAN** bi navê weşana NEWROZ ya du mehane , ji bal Partiya Yekîtiya Demoqrat a Kurd li Sûriyê (YEKÎTÎ) ve tê weşandin ,em bixêrhatina te dikin , gelekî kêfxweş in ku te bi xwendevanên xwe bidin naskirin.

P1- xwezî mamoste tu xwe ji xwendevanên **NEWROZÊ** re bidî naskrin.

B 1*-navê min* ***Lewend Ozkan*** *e ji* ***ALAZÎZÊ*** *me , min xwendina xwe ya yonîvêrsîta beşê (birêvebiriya karan) , ji zanîngeha ANQERê, wergirtiye.*

P 2- Tu di çi beşî de kar dikî?

B 2 *-Di beşê karîkatorê de min karkiriye, min hin wêne çêkirine , û çend pêşengeh li darxistine , li ser zarokên ku jiyana xwe di sikakan de dibuhirînin û li ser zîndanê jî min karîkator çêkirine , û di belavok û weşanan de min belavkirine, ya din pirtûkek min heye , xêzeromane, bi navê (MIRINA JARO) , min ew jî belavkiriye.*

P 3- tu di karî ji me re li ser vê pirtûkê hinekî bi axivî ?

B 3*- ev çîroka sê pêlewanên kurd e, yek ji wan* ***Jaro*** *ye, naxwaze jiyan bi dawî be û dixwaze jiyanek bê dawî peydabike, ji Cizîra Bota derdikeve û berê xwe dide rojê , û piştî gelek berxwedana li dawî Jaro jî dimire. Ez bi hêvî me ku ev pirtûk ciyê razîbûna xwendevanên kurda be.*

P 4- ji bilî vê çi , çi berhemên we yên din hene ?

B 4*- niha ez pirtûkekê ji 7 ta 10 cildan amade dikim, têde ezê li ser şaristaniya kurdan li* ***Zagrosê*** *û* ***dewlata Mîdya*** *şirove bikim, ezê qehremanekî kurd ji wir rakim û ezê wî bi dîrokê re bi rêkim, herweha ezê bidime xuyakirin ka bê çi bi serê wan dihat , weke roman, ezê têde li ser cil , gerdiş , kultûr , cigrafiya Kurdistanê û bûyerên ku bi wan re derbas dibûn di her demekê de bînim zimên.*

P 5- Ji bopêkanîna vî projeyî te têkilî bi kesekî re kiriye?

B 5*- hîn ez di herema Kurdistana Tirkiyê de me ,ezê ji kurdên Sûriy, Îraq û Îranê jî arîkariyê bixwazim û agahiyan ji wan wergirim, ji ber ev proje ne li ser parçekî bi tenê ye, lê belê li ser tevaya Kurdistanê ye, weke min berî niha da xuyakirin, ji kevin de ta roja îro.*

P 6- Çi asteng di pêşiya vî projî de hene ?

B 6*- ji aloziyên ku têne pêşiya min ev in:*

A- *deverê ku ez agahiyên xwe jê werbigrim, bela- wela ne.*

B- *Bi tena xwe ez bi vî karî dirabim, ez hewcedarî arîkariyê me.*

C- *Rewşa aborî. Wê astengin ji aliyê dewletê jî li jî li pêşiya min hebin*

D .R (4)